



Rexne û hêza rexneyê di wêjeyê de



Dergeh:

Mijara Rexneyê, mijareke pirr fereh e, lewra dixwazim bibêjim, ku ez dê bi we re di çarçewa Rexneya toreyî, di başûrî rojavayî welatê me de, xwe bilivênim, tevî ku ew jî zor e jiber ku ta niha ziman û toreya me li wî parçî qedexe ye û nivîskar an jî lêkolîner neşê xwe bigihîne hemî makderên ku belavbûne, çimkî pir ji wan nivîsan piştî xwendina wan dihatin sotandin, sedem jî hun hemî dizanin, vêca ez dê hewl bidim li gor zaniyarên xwe û bîreweriyên xwe(gelekcaran) mijarê dest pê bikim.

Têgeh= Zarawe „ Terminologie“ û pênasîn:

Li berahîkê di vê mijara xwe de, em pêrgî sê têgehên dibin:

Rexne

Tore

Rexneya toreyî

Rexne:“ Kritik“

Peyva Kritik, peyvek e grîkî ye Kritiké“Techné“ wateya wê= hunera nixandinê ye

Kritikos= hunera jihevcudakirin û nixandinê ye

Di Latîni de wateya wê, hunera nixandina helbestê ye.

pirek e di navbera helbestê û cemawer(xwêner) de, diyarkirina xalên bi hêz û ên bêhêz di berhem de, hunera gumanlêkirinê ye û şirovekirina sedemên kartêkirina berhem (text= peyam) li xwêner(peyamwergir).

Şeweyên rexneyê jî ev in:

Rexneya erênî: pesindan û çepiklêxistin

Rexneya neyênî: geryana li xalên reş di peyamê de

R. Konstruktîv „ Sazker= avaker“: nirxandin di gel belgeyan bi mebesta sûdwergirtinê.

R.destruktîv „ Herifandin“: ew rexneya ku li her xalekê bi guman seyr bike û têbîniyên bêsiûde li ser peyamê an jî peyamhinêr binivîse „kesayetî“¹

Rexne li nik **Jean Yves Tadié** « çirûska ku berhemên kevin ronî dike, an jî dahênanê di wan de dike, an jî desthilatdariyê li ser wan dike bê ku mîna wan biafirîne“²

Northrop Frey dibêje : » pêdiviyê rexne bibe zanist, ji ber 2 dêmên wê hene, yek berbi toreyê ve diçe û yê din berbi diyardeyên rewşenbîrî ên din ve, ên xelesa komelayetî û civakî ya toreyê pêktînin »³

Yvan Watt dibêje : « Rexne ew nivîse ku bi tenê berhemekî rabixe, bê ku binirxîne »⁴

Ji van pênasînan tete diyarkirin ku têgeha rexneyê bi pir şeweyan hatiye danîn, ne tenê wilo jî belkî her rêbazeke rexneyî ji xwe re pênasînek daye vî têgehî.

Rexne ne pêveyekî toreyê ye, belkî hevalbend ya rast bi xwe jî toreyê û toreyê bê rexne pêşnakeve, çimkî deq nikare hemî rastiye derbixe, Rexne deq tene panava eşkerekirinê, ji ber wilo jî **Spinoza** rexne weha dibîne “ rexne li ser pêpeloka avahiyê ye, ne ya naverokê, ji ber girift ne danîna rastiyeke şûna ya din e, belê guhertina cihê rastiye di bizava ravekirinê de ye. Pirs nema ew e: Nivîs rastî dibêje? Lê nivîs çi dibêje?”⁵

Rexne pirs e, beriya ku bersiv be, şirovekirin e beriya ku hukmek be, nirxandineke beriya ku êrîşek be. Rexne rexne ye, zayendekî toreyî ye mîna helbest, roman, çîrok û.. pirtir ji wilo jî bê rexneyê toreyê di nav mij û temê de ye.

Lê ka em binerin, gelo peyva **rexne** rast e an jî peyveke din heye?!

Rexne ji 2 kîtan pêk tê rex û ne, ji xwe rex tê wateya kêlek, lê eger em temaşe bikin, em dê bibînin ku pîtên Rexn û nerx yek in lê cihê wan hatiye veguhestin û eger em li wateya wê jî biner in, gişt hemî jêderan behsê nirx kiriye û ereban jî kiriye **Neqîd wate nirx, an jî dirav û dibêjin ew ê rastiye ji nerastiye derbixe**, lewra behwer dikim ku peyva nirxandin rastir ji Rexne ye. Ji bilî wê destê min negiha wê makdera ku yekemîn car ev peyv bi kar hatiye û ne jî dizanim kengî û li kû deverê. Lê peyva Rexneyê cihê xwe girtiye.

Albier Teboudiê di gotara xwe de ya bi navê **Phiziolojiya rexne** 3 cureyên rexneyê ji hev cuda dike:

Rexneya bilêvkirî“ yadgarî û namebihevguhertin, rojname (rojnamevan)

Rexneya pisporî ew rexneya ku mamosteyên zankoyan bi kar tînin ev rexne. Ew jî bi erkan radibe:

2.pesindana toreyê û şirovekirina wê ku ne tenê zanîna zanistên mirovane bike zanîna deqên dema xwe

Rexneya hunermendan: ew rexne ye ya ku hunermend bi kar tînin”6.

6. Rexneya toreyî di sed sala 20an de, Jean Yves Tadié . Erebi, werger a Dr. Qasim Meqdad R.17. şam 1993 belavokên wezaretê Rewşenbîrî

Literatur= Tore:

“**Literatur** : Latîni : nivîsîna pîtan e, daneheva nîşanan e, çîrokên ku di pêpeloka diwem de bi kar tînin. Literatur ziman e, ew yê bi hizran mişt. Toreya nixgiran ew ziman e, ê bê sinor bi hişmendiyê dagirtî ye”7 (Ezra Pound)

7. **Literarischer Fachbegriffe, s. 294, Definitionen u. Beispiele Otto.F.Best.Dez 1991, Fischer verlag.**

„**Literatur**“ **Kevin**“: nivîsîna nivîskarekî/ê li gor zagonên ciwanîyê ên taybet. „ Durv, Naverok, mezinbûn, armanc, hevgerîna deq, zayendek (Helbest) be, û ramana berhem jî hebe”

Literatur“ **nû**: her nivîsa ku bête nivîsîn ew tore ye. Lê eger pêdiviyê ciwanîya nivîsê wek faktorekî sereke be, nimûne helbest an jî berhemên hunera peyvê, ew berhemên ku ziman roleke bingehîn dilîzin, ne tenê ku ziman bi erkê ragihandina nûçeyan rabe, belê ziman bi xwe jî avahiya (Struktûr) berhem ya taybet be û nixê zimên ê taybet hebe. Ji vê yekê tê gotin ev ziman helbestî ye.» [8www.wikipedia.org](http://www.wikipedia.org)

Di pênasîna toreyê de, gişt hemî jêder di yek baweriyê de ne, bo nimûne J.P.Sarter dibêje: “ tore diyarkirina xalên nepenî di mirov û cihanê de”

Tore li def Z. Theodorv ew e” tore ne tenê geryana li rastiyê ye, belê ew rastî bi xwe ye” 9.Rexneya rexneyê Zivitian Theodorv, erebi. W. Samî Swêdan (Merkez Alimai, li qewmî Beyrût 1986 R. 9

M.Kondêra di pirtûka xwe de “Hunera Romanê” dibêje: “ Tore, hewldaneke ji bo ronîkirina hêleke tarî ji hebûna mirovayetiye”

10.Hunera Romanê komek gotar û hevpeyvîn, bi elmanî ji Ferensî Brigitte Weidmann. W.xana Fischer. 1989 Frankfurter am Main r 31.

Rexneya toreyî:

„Ew nivîsîn in, ên dihingivin berhemekî, bi hûrbîni tete xwendin û pêşanîkirin an jî li ser tete peyvîn” ” 11.www.wissen.de.

Wahrig.

Têkiliyeke pisporî ye di nêvbera xwêner û toreyê de, gera li dûv nixê berhem e. Rexnegir bi xwe, hunermend e, mirovekî taybetmend e, têgehiştî ye, dişê rê û resim û nixê berhem biparêze, pêşkêş bike, bi berpirsiyarî li gor pîvanên hunerî û êstatîkî (Ciwani) û normên zanistî rexne bike. Bi hizir, têgehiştin û rastiyên kesayetî „Subjektîv”

Girêdayîne” 12. **Literarischer Fachbegriffe, s. 294, Definitionen u. Beispiele Otto.F.Best.Dez 1991, Fischer verlag.**

Rexneya toreyî berhemeke dikeve bi xizmeta xwêner û berhem de, li

gor kartêkirin û nîşanên hundir û derve berhem dinirxîne. Ev Rexneya toreyî dikare çape be „ Pirtûk, kovar, rojname” û dikare media be“ TV û êzge“ [13.www.wikipedia.org/wiki Literaturkritik](http://13.www.wikipedia.org/wiki/Literaturkritik).

Ji vê bêhtir dikare îro Digital jî be „ Internêt“.

„**Theorie“ Bîrdozî**“: Texmînek e di çarçewa siruşt û durvê mijarekê de dilive, ku em dikevin nav de û pêwendiyên wê ên hundur vedikin. Ango têramandina di mijarekî de û bi şûn ve li ser mijûlbûn û guftûgokirin.

Methodê“ **Rêbaz**“: raxistina alavên teknîkî û danîna yasayên hûr bo wan. Mijûlbûn li ser mebestên ku rexne bo wan di liv û tevgerê de ye“ **14.Jean Starobinsky/ La Relation Critique**, bi erebî wergera **Bedreddîn Al-Qasim weşanên Wezaretê Rewşenbîrî şam 1976 R. 7**

Ekol, rêbaz, bîrozî û dibistanên rexneyî:

Li vir dixwazim çend nimûneyan ji rexnerên cîhanî bi nav û deng bînim, an jî ên li ser dîroka rexnegirî nivîsîne, da em bibînin ka ew çawa dibistanan parve dikin.

Jean Yves Tadiè, di pirtûka xwe de ya bi navê Rexneya toreyê di sedsala 20an de rexneyê weha rêz dike.

Formalîstên Rûs. (**russische Formalisten, formalistes russes**)

**Xelesa Moskowayê 1915-1930.Schoklovisky-Thomashevsky, Tiniyanov, R.J.

**Xelesa Prag 1926. Prof. W.Matheuisus, Mukarowisky, Vaşk û R.Jacobson

Rexneya Elmanî. (**Die Deutsche Kritik, critique allemande**)

Rexneya hiş (**Kritik des Gewissens, Critique de la conscience**)

**Dibistan Gênf, M.Rîmon, G.Poliè, J. Russè, J.Starobinsky

Rexneya derûnî (**psychoanalytische Kritik, Critique psychoanalytique**)

Rexneya sîberî Xeyal (**die Kritik der Imaginären, C. de l, imaginaire**)

Rexneya civakî a toreyê (**soziologie der Literatur, Sociologie de la Littérature**)

Zimanzanî û Tore (**Linguistik u. Literatur, Linguistique et Littérature**)

Watedariya toreyê (**Semiotik, Sèmiotique de la Littérature**)

Helbestiyane ya toreyê (**Poetik, poétique**)

Rexneya avaker (**genetische Kritik, la critique gènèntique**)

J.Y. Tadiè çend têgehên din bi kar anîne, da ku prosesa xalên rexneyê diyar bike, ew jî evin : ravekirin û prozentuala ravekirinê, avahiya jîwarî û ravekirina lêkdanewî.

15.www.literaturkritik.de/Prof.Dr.Fee-AlexanderaHaase : Kritik.

Lê em dibînin dema **Roland Barth** ê Simiotîk behsê rexneyê dike çend têgeh û zaraweyan bikar tîne mîne, Rastiya rexnegir, çêj, zelalî,

Simbol, û aloziya şirovekirinê.

Di pirtûka xwe de ya bi navê Tore an jî Dîrok, pirs dike Rexne çi ye û bersivê dide:

„ Her rexneyek, rexneya berhem û rexneya xwe bi xwe ye jî“

16. bi erebî ji W. Dar Tobîqal, wergera Ebdul Ezîz bin Erefe, Tore an jî Dîrok, sal 1987, r. 94

Z. Theodorv di pirtûka xwe de ya bi navê Rexneya li ser rexneyê, dibêje:

„ Hemî tişt ravekirin e“ û weha rexneyê û şeweyên wê parve dike û dibêje ev rêbazên rexneyî ne ne ekol in:

Rexneya nû Hermeneutique (Ravekirin)

2- Rexneya Derve

3- Rexneya avahiyan (Structuralisimus)

4- Rexneya Derûnî an jî Freud î

5- Rexneya Sosiyologie, civakî

2- Rexneya dîrokî.

17. Rexneya rexneyê Zivitian Theodorv, erebî. W. Samî Swêdan(Merkez Alimai, li qewmî Beyrût 1986 R. 128-140

J. Starobinsky di pirtûka xwe de rexne weha rêz dike bê ku tu navî li wan bike, aya dibistan e an jî rêbaz in, an jî bîrdozî ne, lê bêhtir bi ser teoriya toreyî ve diche, ji ber dibêje: „ çendî rexnegir xwe bi rewşenbîriyê dewlemend bike dê bizanibe çawa guhertin di teoriyan de çêdibin û guhertinê li têgehiştina berhemên toreyî de dikin“

18. Jean Starobinsky/ La Relation Critique, bi erebî wergera Bedreddîn Al-Qasim weşanên Wezaretê Rewşenbîrî şam 1976 R. 7

Lewra jî weha rexneyê û şeweyên wê rêz dike:

Rexneya Sosiyologie civakî

Rexneya şirovekirina derûnî

Rexneya Strukturalîzim û post strukturalîzmê

Rexneya diyardeyî „Phinominologie“

Rexneya zimanewanî.

19. Jean Starobinsky/ La Relation Critique, bi erebî wergera Bedreddîn Al-Qasim weşanên Wezaretê Rewşenbîrî şam 1976

Baxtîn yek ji wan ên ku bi hişekî vekirî li toreyê temaşe dikir bê ku ta bi dawî bête hesanbikirin li ser dibistanekê, qonaxên ramanî ên rexneyê weha dît:

Phînomînologie

Sosiyologie

Linguistik

Dîrokî

Poetik.

Lê stûnên karê rexneyê li ba Baxtîn weha bûn.

-Daneheva hemî hebûnên madî û dubare lêkdana wan di ajotîneke(siyaqeke dîrokî de.

-Bikaranîna ravekirinê bi alîkariya zagonên civakî, derûnî û biologie jî
-Şirovekirin rêka diyalogê ye ku azadiya mirovane bizîvire.

20. Rexneya rexneyê Zivitian Theodorv, erebî. W. Samî Swêdan(Merkez Alimai,i liqewmî Beyrût 1986 R. 11

Li vir Baxtîn û Sartre digihin hev ku „ Wate azadî ye, ravekirin bikaranîna wê ye.

21. Rexneya rexneyê Zivitian Theodorv, erebî. W. Samî Swêdan(Merkez Alimai,i liqewmî Beyrût 1986 R. 11

. Ji hêla rexneya Simiologie ve jî rola Umberto Eco ji bîr nabe, ku ew li nîşanan digêr û di rêya nîşanan re, deq ji hev dixê û dîsan lêkdide. Grûpên mîna Tel Quel û J.Chirstiva jî ko ji hêla Intertextulîtê „ Hevdeq= Hevheyber“ ve roleke wan î berçav heye, ku ew jî mîna N. Frey dibêjin hebûna deqên kevin ên ên nû de tim heye û pêdiviye berawird bibe „ daneberhevkerin“. Nûnerê rexneya nû li Italiyayê **Benetto Croce** pêramandina ku di hundurê rêbazekê an jî ekolekê de rexneya toreyî binivîse hilnabijêre, lê daxwaza pêkanîna alavên nû di nivîsîna rexneyê de, ku serbixwe û azad bin û nekevin bin badora tu hêlan.

22.www.literaturkritik.de/Prof.Dr. Fee-Alexandera Haase : Kritik

Di postmoderinîzmê de, têgeha rexneya toreyî ji bo lêpîrsîna nirxan di toreyê de, têtê bikaranîn.

Postmoderinîzim rexneya toreyî celebek û zayendekî toreyî dibîne û weha lê temaşe dike, ji ber wisa jî lêkolîna di vî babetî de, dubarekirina rûdanên zimanewanî dibîneû mîna durv û nîşanên têgehên dibîne û wisa jî rexne=Tore di astengê de dibîne.

Li vir Nûser= xwêner= rexnger e.

Jürgen Schiewe di sala 1998an de li ser xwêne“Rexnegir” di mijara xwe de got: “dîrok zimanê rexnengirtinê ye, ku lêkolînên nû rexneyê mîna rêbazekî toreyî dibînin, lê bi dûrv û qalikekî nû”

23.www.literaturkritik.de/Prof.Dr. Fee-Alexandera Haase : Kritik

Rexne di toreyaya kurdî de:

Bo her dosttoreyaya kurdî diyar e, ka çima ta niha rexneyê cihê xwe di toreyaya me de negirtiye. Belkî pir rewşenbîrên qedirgiran ta îroj jî dibêjin “ bela bi kurdî, ku çawa jî be”. Lê gelo eger em li paş xwe bizivirin, em dê nebînin ka çendî ziyar ji ber vê hevokê gihaye toreyaya me, bê ku em astengan jî i bîr bikin?!

Bo em vegerin babeta xwe, ka kengî, di kîjan belgeyê de, û kî gotar nivîsîne, ku em navê rexneyê li wan bikin, li gor wan pênasînen jor ên me nivîsîn!.

Ez dê bi lez û bez behsê tişta ku di vê dema kurt de, pê agahdar bûm bibêjim, lê dê li ser 2 pirtûk ji wan sê pirtûkên ku ta niha derketî rawestim.

Piştî geriyaneke li gotar, têtîbînî û pirtûkên rexneyî bi zaraveyê kurmanjiya jorîn li başûrê rojava, me dît ku hijmareke baş ji gotar û

têbîniyên rexneyî curecur di kovarên kurdî de belav bûn, lê mixabin nehatine serhev, ku bibin hêzek û bandora xwe li toreya kurdî bikin. Her ji destpêka weşana kovara Hawarê de û di himara yekem, rûpelê 5an seydayê hêja Dr. Kamîran Bedirxan gotarek bi navê “ Edebiyata welatî” nivîsiye. Dr. K. Bedirxan di gotara xwe de, bi sivikî dihingivê rexneya sosiyologie, dema dibêjê” *Edebiyata welatî, ew edebiyat e ko ji jîna miletî, ji hiş û dilê wî, ji stiran û laje yên wî hilêt. Kaniya wî dilê milet, hiş û heyata wî ye Her wekî nas e, fikr û his di dora zimanî de dêgehînin hev, û her ziman û fikr û hisên xwe û awayê gotina xwe bi xwe re hildigire û ew pê rediguhêzin, û pey zimanên xwe dikevin*” **24 Hawar Hi. 1 R. 5 sal 1932**

Ji ber ku Hawar destpêk bû, lewra rexne tê de kêm bûn. Belkî kem nivîskaran pir agah ji toreya cîhan û ya kurdî jî hebû. Lê dîsan rûpelên Hawarê xwe ji vî celebî ji toreyê bêpar nemane, seydayê Cegerxwîn, di hijmara 22an de, li ser hespên xweşxwanên kurdî gotarekê dinivîse û tê de diyar dike ku hespên xweşxwanên kurdî 4 in û weha dibêje: “*Tu bizan ji rê ve hespên xweşxwanên kurdî çar in.*

Ê çeleng û ê laxer û ê sivik û ê rewan. Hespê çeleng du gavan davêje. Hergavekê pênc movik tê de hene. Ê laxer du gavan tavêje. Hergavekê şeş movik tê de hene. Ê sivik du gavan davêje û hergavekê heft movik tê de hene. Ê rewan du gavan davêje û hergavekê heşt movik tê de hene. Ez hêvî ji heval û hogiran dikim eger kêmaniyek di hespên min de dîtin bire rast bikin û derbas bin çiku hespê çê bi ketinekê fihêtkar nabî »
25.Hawar 22. sal 2. Yekşem. 1.tîrmih pîtên erebî.

Rexne û gotara herî balkêş di zimanê kurdî de di salên 50î de, ku bi rastî wek rexne mirov dikare nav lê bike û wek destpêka rexneya kurdî bihesibîne, pêşgotina hêja Dr. N. Zaza, ku ji Dastana Memê Alan re nivîsî bû. Dastan Memê Alan, ji hêla çapxana Kerem li şamê hatibû çapkirin. Di vê pêşgotinê de, Dr, Zaza balê dikişîne li ser beramberhevkirina metolojîya Girîkan û yên miletên din û kurd jî û nimûneyan tîne ku pir nêzîkahiye li Memê Alan dikin. Dr. Zaza bi hosteyî li ber buyer, cih, amaje, nîşan û liva dastanê radiweste. Ev şêwe rexne, ne gelekî kevin e di cîhanê de, belkî hinek guhdar bibêjin, ku ev berawerkerin e, lê ez dibêjim nexêr navê wê rexneya li ser rêbazên Hevheyberiyê ye (Intertextualitê ye, ku pêşî N. Frey û di pey re salên 80 û 90 J. Kristiva, û grupa Tel quel û digel wan jî rexneya simiolojî ku Barth, Pier Jiro û ta radeyek Derrida jî meylidarê vî cureyî rexneyê bûn.
» *Ewropiya berî me qiymeta wê Naskirine(Memê Alan » û lez dane xwe ku vê destana evîneke pak û bilind, bi laş û bi gewdebûna rûçikên miletê kurd ên berztir, bêxine pêş xwendewarên xwe.*

26.Memê Alan, pêşgotin Dr. N.Zaza

Dr. Zaza di dema xwendin û guhdariya xwe ji vê Dastanê re, bi hûrbînî lê temaşkir û pirsên mezin li hemberî wî derketin wek wî bixwe gotî û

ew pirs bi nav kirin:

pirsên dirpki "bingehê wê ji Isa Pexember pir wê da ye" 27

Dîroka qehremanên Destanê" Di wexta mezinahiya Iraniyan de, dewlemendiya imperetorên wan bê payan bû. Padişah carnan Furs û carnan kurd bûn.." 28

Rewşa edebî. "em dirêj nakim. Eger em bigerin hîn pir tiştên hêjatir dikarin peyda bibin" 29

Pirsên civakî 30

"Di vê pêşgotina xwe ya dirêj me xwest dewlemendiya çîrokeke kurdîbêxine ber çavan. Di Memê Alan de, hîn pir tişt heneku divê bêne derskirin. Me bi tenê di vî warê de rêyeke biçûk vekiriye" 31

27-30 Memê Alan, pêşgotin Dr. N.Zaza " çîroknivîs

Ji bilî di wan gotaran de jî pîr gotar di kovarên din de hene, eger bibûna bingeh dikaribûn bibin binaxeyeke baş ji bo rexneya kurdî, lê mixabin ta niha negehayê hev. Kovarên mîna Stêr, Aso, Zanîn, Pirs û yên din, pîr gotarên bi nirx himbêz kirine.

Rexnegirê baş çi dike?

Rexnegirê baş berê xwêner berbi pirtûk û gotara xwe ve dibe xwêner vedixwêne xwendinê. Çirîskên pêşîn ji pirtûk destnîşan dike, ev çirîsk dikarin çirîskên dîrokî, zimanî an jî her heyokeke ku taybetmendiya nûser balkêş dike, ji bilî ku rexnegir bi xwe jî xwedî rêbazekê be di nivîsîn de û zimanekî di asteya lêkolîn û rexneyê bi dest xwe ve bîne. Di civatên paşketî de, peyva rexne tim bi hêla neyênî û xerab vebestiyayî ye, tevî em dizanin ku rexne ne weha ye, belê nirxandin û nirxpêdana berhem an jî deq e. Rast e erkê rexnegir girêdana têkiliyan di navbera xwêner û berhem de ye û ronîkirina quncikên tarî di deq de ye, lê nayê wê wateyê ku pêdiviye ta bi derziyê ve bike, çimkî êdî em li vir dê pêrgî xwênerekî bêkêr bibin.

Li def gelek rexnegiran mîna R. Barth „xwêner bi xwe nivîskar û xwêner û rexnegir e“ 32. Nivîsîn di pileya 0 de

Pêdiviya rexnegir binivîse bo çi berhemê li ber daye ber nirx û lêkolînê û ziman û navroka berhemê daye ber lêkolînê ravebike,

jîbilî wisa jî divêt li xwe bipirse aya wî ev berhem di demeke bo wî baş de xwendiyê? Aya bandorê derdorê lê hebûn? Bi wateyeke din pêdiviye rexnegir li xwe mukur bê ka dema wî rahêjte vî berhemî di çi rewşê de bû, an jî ew agahiyên têra rahiştina berhem bi dest xwe anîne?

Rexne ne ev berhem baş e an jî nebaş e, belê şirovekirin û xwendina element û regezên ku di nav xêzan de hene ne di xêzên nivîsî de. Wate regezên nebeşdar amede bike. Di dawî de dixwazim lîsteya daxwazên Adorno li jêr binivîsim çimkî behwer im ev daxwaz bo her rexnegirê û her demê dibin:

„Pêdiviye nûser rexneyê van xalan pêk bîne:

autonom be serbixwe

bi hûrbînî û çavsorî li berhem seyr bike bê ku bigihe sînore kesayetiyê. Tenê di çareçwa tore û berhem de bimîne.

pêdiviyê di zeviyê ku rexne lê digirê agahdar û ta radeyekê rehber be, di hunera berhem de têgehiştî be.

pêdiviyê bandora hukmên hineke din lê nebe.

Toreya rexnegir:

aste û qalîteya wî bilind û berz be

bi civakê re rast û hevdem be" têbînîyên min li vê xalê hene"

girêdayî pişê çandeyê be

Karê wî kartêker be:

hêdî hêdî baweriya xwe biaffrîne, ango piştî xwendina berhemî.

pêdiviyê rexne mîna toreyê li gor pêveçûna civakê bête dîtin û tegehiştin". 33. Adorno Noten zur Literatur Suhrkamp, 6. Aufl., Frankfurt/Main 1994, Or.-Pp., S708 S.87

„pêdiviyê rexnegir amade be, bîr û rayên cuuecur ji hev derbixe û nekeve bin kartêkirina tukesî ta bigihe wê radeyê xwe ji desthilatdariya xwe bi xwe jî rizgar bike.“ 34. Theodor W. Adorno - Studien zum autoritären Charakter. Suhrkamp, 6. Aufl., Frankfurt/Main 1994, Or.-Pp., 708 S S.125

Rexne bi hêztir dibe eger, rexnevan agahiyan li ser mtêbîr, raman û berhemên nûser bizanibe, çimkî barê wî sivik dibe û çirîskan bo xwêner ronîtir dibe.

Jibilî wilo çend têbînîyên teknîkî hene gereke rexnegir jibîr neke.

Navê jêderan, weşanxane, sala weşanê, cihê weşanê, hijmar û pîvanên pirtûka ku li ber nîrxandinê ye hijmara rûpelan, navê nivîskar.

Tiştêkî din pir girîng heye, pêwîste rexnegir xwe dûrî taybetmendiyên kesayetî ên nivîskêr bike û rêzê li nivîsîn, nûser bigire û ew bi xwe jî xwedî bingeheke rewşenbîrî û stîlekî taybet û pal bide ser bingehe û stûnên Zanista toreyî.

¹www.wikipedia.org. Wahrig elmanî

²Rexneya toreyî di sedsala 20an de, Jean Yves Tadié . Erebi, werger a Dr. Qasim Meqdad R.19 şam 1993 belavokên wezaretê Rewşenbîrî

³ Rexneya rexneyê Zivitian Theodorv, erebî. W. Samî Swêdan(Merkez Alimai,i liqewmî Beyrût 1986 R.10

4. Jêdera ³R.10

5. Rexneya rexneyê Zivitian Theodorv, erebî. W. Samî Swêdan(Merkez Alimai,i liqewmî Beyrût 1986 R. 20

